Danezana Şamê
li ber gef gurên man û nemanê

Ji berê û paşê ve , tirsa mezin ya rijîma Sûriyê ya awerte , rêzder, û nebiservehatî, ji danûstandin û lihevkirina di navêna hêzên nştîmanî yên rikber û bi taybetî yên Kurd û Ereb de ye. Vêca ew bi her awî hewil dike ku, her biçe bawerî di navêna wan de nemîne , û kend, bend û dîwar werin avakirin . Ji ber ku, ew dibîne çiqas gel û hêzên wê yên nştimanî û demoqras li Sûriyê ji hev ve nêzîk bibin , ewqas temenê wê kin dibe , û ziyan digihêje berjewendiyên wê .

Piştî lidarxistina Encûmena nştimanî ya Danezana Şamê li 2 ê Berçile 2007an , bi beşdariya 166 kesan ji nûnerên hêz û partiyên pişikdar û kesên serbixwe yên demoqras çi Ereb , Kurd , Asur , demoqras, lîbral, olperest û netewî , bi awaki rêk û pêk û serkeftî li orta paytextê , herweha seknandina beşdaran li ser hemî pirsgirêkan bi awakî demoqras û şaristanî, û standina gelek biryaran di pir waran de , ji guhertina demokras ve bigir , di çareserkirina pirsa kurdî bi şêwakî dadmend re derbas be ,…….û H.W.D . Paşê jî , avakirina qelafeta Danezanê , hilbijartina komîta serokatiyê ji pênc kesan û heftdeh kesan ji Emanê elamê re , û li dawiyê ristin û rawekirina daxuyana dawîneya civatê . Ev karê he ku , cara yekê di dîroka Sûriyê de , di nav rikbera wê de , û di hundir de tê kirin , girîze û tirsek berda govdeya rijîma Sûriyê .Û wê hîşt ku, veciniqe û li ber vê xebat û çalakiya pîroz ya Danezanê (Ragiyandina Şam – Îlan Dîmeşq) bisekine û rawest e. Ka wê çawa û bi çi awî kanibe Danezanê weke Buhara Şamê (Rebîi Dîmeşq) ya 2001an, pûç bike û ji hev bişelîne?.

Gava yekê bi biryardana elemin elqewmî , di riya şaxa emin dewlê re , di yek wextê de , li seranserî parêzgeh û herêmên welêt , dest bi pêla girtinê kir . Bi dehan endamên beşdarî civata encûmenê bûne hatin girtin , û jêpisînên cubecur ji wan hatin kirin. Da ku, bizanibin rewşa civtê çi bû û kî bûn kesên lê beşdar? . Hin ji girtiyan di cî de berdan , hinên dî (24) katan li cem xwe hîştin , û hinek jî bernedan . Dûre bi wê tenê nekirin , pêla girtinê berdewam kirin , lê vê care di mofirkên serekîn de bû . Wek, Dr . Fîdai Ekrem Horanî , Riyad Sêf , Dr. Ehmed Tu,imê , Mamoste Ekrem el- Bunî , Elî Elebdele, Mihemed Hecî Derwîş ,, şêwekar Telal ebû Dan , ….û H.W,D , ta niha hejmar gihaye 13 an . Li vê dawiyê ew bi jarkirina hesta Erebperestiyê û gurkirina kurdperestiyê li Sûriyê gunehkarkirin û dane dadgehê. **D.R (11)**

Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de